

## Kongirê – 6-an li kê pîroz be ?

Enehîte Mored

Li dawîya çiriya paşîn, partiya me ya pîroz yekîtiya demiquras a Kurd li Sûriyê (Yekîtî) kongirê xwe yê şeşan --weke her car- bi rêkûpêk di bin siya dirûşimên şaristanî û balkêş de lidarxist. Piştî bidawîkirina kongirê û derketina daxuyanê; Em bi navê xwe û rêxistina jina Kurd li bajarê Helebê, kongirê şeşan li hemû heval li der û hundir welêt pîroz dikin. Hêvî û armanca me ew e ku , hemû hevalên partiya, me nemaze komîtên berpirsiyar , biryar û dirûşimên kongirê û nemaze yên di warê rewşa jinan de, ji bîra nekin . Pêwîste ew di xebata xwe ya rojane de, lê xwedî derkevin. Ji ber ku dirûşima ku jin nîvê civakê ye û perwedekara nîvê dî ye- ango can û giyanê jîyanê bi xwe ye- ne wilo?. Û ev rastiya nemîne dirûşime û henek û hew. Lê mixabin, ev dirûşimên ji vê rengî tenê di civat û boneyên partî de têne hildan . Pişt re zû û pir bi lez ji bîr dibin ! Bêgûman ev rûdawa di nava partiya me de û belkîm jî kê - zede li ba baskên dî ji tevgera me ya niştmanperwer, ne nîşana xêrê ye ?. Li vajayî wê, nîşana nezanî û paşmayîn bi xwe ye . Ma gelo, kî nizane ku , rêxistina jinan di nava tevgera Kurd de -nemaze di nêv partiya me de- serdestiya xwe cî negritî. Sedemên vê yekê jî gelek in : Em bi kurtebirîn dikarin bêjin :

- Ligel ku em di sedsala bîst û yekan de ne , hêj em di bin bandora gerdîşên civakî yên pûç û vala de vedigevizin û li ber xwe didin . Lewre jî , hemû sûc û

gunehkarî di sukira mêran de ye, ji ber ku , mêr serdar e û di her warî de xwedî biryara dawî ye. Vêca jî egr em li dawîya salên Heştê ta navîna salên Nodî weke nimûne veşerî û li dîroka rêxistina jinê temaşekin ; Em ê baş têbigehên ku çima rêxistin di nava partiya me de geş bû û roj ji rojê hewş vedida. Bêgûman bersiva vê pirsê hêsan û zelale?. Di wê demê de , hemû pirojeyên partî , berên xwe dabûn Markisiyê . Loma jî , kê - zede baweriya hevalên mêr bi xebata jinê di nava tevgerê de bilind bû . Piştî hevgirtina Sofiyet hiliweşî û heyama Markisiyê nema ; pêre -pêre jî pir bawerî û nêrîn hatine guhartin. Yek jê baweriya hevalên me bi xebata jinê kê - m û qels bû ! Ma xwendevanên vê nêrîne çawa dibînin!?. Bi ya me be , ev yeka ji sedemên bingehî ne ku , îro hevalên (peya- zilam) -nemaze yên di komîtên berpirsiyar de dixebitin- , wan piştî xwe dane rewşa jinê, û ne xemxwer û berketiyên nîvê civaka Kurd in . Belam tenê ew dirûşimên mezin û balkêş hildidin ta ku , kêmasiyên xwe ya heyî veşerî û bi rûkî şaristanî xwe li pêş raya giştî li der û hundir welêt nîşan bidin . Weke pêşiyên me gotine : Dikale lê şîr nade . Li dawî weke têbîn û dilxweaziya me piştî kongirê -6- an û bi sala nû re heval tev baweriya xwe bi xebata jinê geş û bilind bikin , rê li pêş keç , jin û xweîşkên xwe vedin û dûz bikin .

**sersala we pîroz be û nîşana we demikrasî û wekihevî be**